Divê kengê zarokên nexweş li mal bimînin û neçin baxçeyê zarokan an dibistana seretayî?

1. Gelo di 24 saetên dawî de zaroka/ê we tay, kuxikê, êşa qirikê an şîlika pozê kiriye?

- Zaroka/ê xwe li malê ragirin.
- Divê zarok testa Covid-19 bide.

Eger zarokî tenê şilava pozê yan xilt/rijandina ava pozê heye, ew dikare biçe baxçê zarokan/dibistanê û ne hewce ye ku testa Covid-19 bide.

Ev ji bo zarokek ku alerjiyên berê hene jî rast e.



Eger sirê ji zarokî dabe, û babetên jêr li ser derbasderin, bi doktorê xwe re têkilî daynin:

- Zarok naxwaze bilîze an çalak be.
- Zarok tûşî tayê, êşa masûlkeyan, kêm xwarin, bêhalî, serêşî yan gêjbûnê ye.
- Zarok di bênkişandinê de zehmetiyê dikişîne û/an di bênvedanê de ji ya normal zûtir nefesê dikşîne.

Ji bîr mekin ku zarokên biçûk nikarin halê xwe bêjin, dibe ku bênteng be, bi we re girêdayî be, an zû aciz bibe. Eger hûn li ser zarokê/a xweya nexweş bi fikar in, divê hûn her dem bi doktorê xwe an bi karûbarê bijîşkî li derveyî saetên karî re têkilî daynin.

2. Geo encama testa Covid-19 erênî ye?



Erê

Divê zarokê/a we li malê bimîne.

berpirsên bajêr dê ji we re bêjin dema ku zaroka/ê we nexweş e, divê hûn û malbata we çi rêzikan pêk bînin.

Na

Dema ku zarokê/a we baştir bû û taya wî/wê tune bû, ew dikare biçe baxçeyê zarokan an dibistanê.

Tevî ku zarokî hîn jî nîşanên sivik wek xilt/rijandina ava pozê hebe, êşa qirikê an kuxikek sivik jî hebe, ew dîsa jî dikare biçe baxçê zarokan an dibistanê.

NIPH